

Nûh li ser KORONA

KURMANJI
HEJMAR 27
Sibat 2021

Alîkariya firotgehê bikin ku enfeksiyo nê dûr bixe!

Dema ku hûn ji bo xwarinê digerin hûn mesafeya xwe digirin?

Ma hûn malbatê xwe li derveyî dikanê dihêlin?

Ger nîşanên we hebin hûn li malê di mînin? Başê! Hingê hûn xerîdarek ku berpirsiyariyê digirin.

Hikûmet bi berdewamî dixebite ku cihên ku enfeksiyon belav dibe bibîne. Paşê wan ji bo wan deveran rêzik danîn da ku rîsk kêmbibin. Rêgezên nû ya pandemiya demkî qaîdeyên ji bo nimûne, navendên kirîn û firotgehên vedigire.

Her kesê ku firotgehê wan hene divê wiya ji bo karmendên xwe û ji bo xerîdaran bi ewlê bikin. Lê divê yê ku li firotgehê dikirin jî berpirsiyariyê xwe bigirin.

Pêşniyar: Bi vê awayê hûn dikarin li firotgehê berpirsiyariyê xwe bigrin:

- Heger nîşanên we yê covid-19 (korona) hebin, neçin dikanan.
- Di demên ku gelek pir xerîdar nînin hûn dikarin herin firotgehê.
- Bi tenê li firotgehê bikin. (Zêdetir nekevin firotgehê)
- Ger karmend bêje ku pir kes hene di firotgehê de, li derveyî firotgehê bisekinin
- Rêgezên firotgehê bişopînin

- Qet ji hev nêzik nabin - ji xerîdarê din re bi qasî 2 metreyan bisekinin
- Ger kesek pir nêz bibe paş ve vegera an ji wir bi dûr kevin
- Alkolê destan an jî destên xwe bi avê û sabûnê bişon

Pir rêgezên hişk hene dema ku Desteya Administratîvedarî ya wîlayetê firotgehê kontrol dike

Di rêgezin nû ya ku di 10 Çile de dest pê dike, dibêje ku divê firotgehê rêzikên ku hatine saz kirin bişopînin. Ji bo ku pê sag bimînin, hikûmetê li jneyên rêveberiya wîlayetê wezîfedar kir ku firotgehê agahdar û kontrol bikin.

Li Navçeya Kalmar, Åsa Axheden serokê wê xebatê ye.

"Em ê li qasî ku em dikarin dikanan bigerin da ku bicîh bikin ku ew rêzikan dişopînin. Em şîretan li ser awayê kirinê dikin, û ji wan re dibêjin ku wan bişopînin. Heger wana dema ku em vegezin xeletî rast nekiribin, ew dikarin werin cezakirin, "ew dibêje. "Her weha girîng e ku xerîdar ji bo firotgehê hêsan bikin ku tiştê rast bikin."

Divê hemî firotgehê vê yekê bikin:

- Pîvan û hesab bikin ka di heman demê de çend xerîdar dikarin di firotgehê de bin: (Her mirovek 10 metrekareyan piştî daxistina hemî jimargehê, refikan û alavên din di 10 metrekareyan de kesek)

Nîşanek dînin li derva dikanan ku çend kesan di eynê wextê dikarin hebin. Piştrast bikin ku pir kes nekevin hundur



Agahdarî her du hefteyan

Ev pelê agahdariyê ji Hevkariya krîzê li Kalmar län tê. Hevkariya krîzê Kalmar län, hevkarîyek di navbera hemî belediyên wîlayetê, Herêma Kalmar län, Desteya Administratîvedarî ya wîlayetê Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de. Di krîzê civakê de, em bi hev re biryar digirin û alîkariya hev dikin.



VÄSTERVIKS
KOMMUN



facebook.com/krissamverkan.kalmar

Nûh li ser KORONA

KURMANJI
HEJMAR 27
Sibat 2021

Piştirast bikin ku ew bi hev ra kom nebin, dema ku diçin derve yan dikanê

- Ji bo xerîdaran alkol destan an sabûn û av hebe
- Bêjin ku rêzik werin şopandin
- Xerîdar agahdar bikin ka mirov çawa enfeksiyonê kêmbike
- Xwe li ser rêzîk û qanûnên covid-19 (korona) agahdar bikin
- Her tiştê ku we kiriye binivîsin

Qanûnên nuh ...

Navê wê "Qanûn (2021: 4) li ser qedexeyên taybetî ye ji bo sînorkirina belavbûna nexweşîya covid-19".

Ew tê xwyan ku ji bo sînorkirina enfeksiyonê divê çî were kirin.

Ji bo ku mirov karibe qanûnê bikar bîne, divê rêzîkname jî werin nivîsandin. Ew bi hûrgulî dibêjin ka mirov çawa qanûnê fêmbike.

Ji rêzîkên li ser firotgehan HSLF-FS 2021-2 tê gotin.

Naha em bêriya vaksînan dikin . . .

Di demek nêzîk de her kesê ji 70 salî mezintir vaksîna covid-19 (korona) yê bistînin.

Di demek nêzîk de nameyek yê werê ku her kesê ku di 1951 an zûtir de çêbûye hebe. Name bi swêdî ye. Ew dibêje çawa mirov vaksîlêdanê bibe.

Pêdivî ye ku hûn çêtirîn li ser 1177.se wextekê bigrin, lê hûn dikarin li navenda tenduristiya xwe jî telefon bikin.

Gava ku hûn veksîna yekem bistînin, hûn di cih de demek nû digirin ku hûn veksîna jimare du bistînin.

Vaksîlêdana li dijî covid-19 **her dem** belaş e!



Agahdarî her du hefteyan

Ev pelê agahdarîyê ji Hevkariya krîzê li Kalmar län tê. Hevkariya krîzê Kalmar län, hevkarîyek di navbera hemî belediyên wîlayetan, Herêma Kalmar län, Desteya Administratîvedarî ya wîlayetê Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de. Di krîzên civakê de, em bi hev re biryar digirin û alîkariya hev dikin.



**VÄSTERVIKS
KOMMUN**



facebook.com/krissamverkan.kalmar